

Dema tablet pc'yan destpêkir

» RÜPEL 9



Teknoloji

Farmiga "Hişê wî di Hewa" de ye

» RÜPEL 8



Çand

Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital / 07.02.2010

Hejmara 4

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com / hawar.hk-mg.net/PESKETIN

pesketin@hk-mg.net



Îran dixwaze ci bike?

Îran dev ji gavêne xwe yên xeter benade.. Îran li aliyeke dibêje dewlemed kirina uranyûmê dikare li dervey îranê pêk bine li aliyeke din ji fuzayan diceribîne. rûpel 6

KCK; Bila sileh bi dualî werin rawestandin

Di diroka dengbêjîya kurdan de Evdalê Zeynikê pirê dengbêjên kurd e. rûpel 8

Di kongeraya BDP de li aliyeke bangâ yekîtiya Kurdan, aliyeke din Tirkîyeyî bûn » r.2

Barina berfê li herêma Serhedê û başûrê Kurdistanê zêde dibe... » r.3

Îran him dibêje "li hevhatin" him ji fuzyan dişîne » r.2

Timêne Hewlêr û Pêşmergeyê Silêmanî serketin » r.10

Heywax!; Ji %90'ê internetê tije bû..

Dewama nûçeyê di rûpela 8'an de



Ciwan Haco; Divê ji bo çareseriye bi PKK'ê an ji BDP re rûne R2

Naveroka Din
» Gotar r.5-6
» Zanist r.8
» Aktuel r.10
» Çand r.8

Sinemaya Kurdî heye, sekotor tune ye... SERHAD B.RÊNAS » r.5

"Ger AKP dixwaze bi rastî pêşî li ordiyê bigre divê ji nû ve vegere ser bûyera Şemzînanê!..." » r.4

GOTAR
Kurd dersa demokrasiyê didin Ereban
HUSEYIN ABDÜL HUSEYIN
Ji TheNation şiroveyek.
R5

AKTUEL
Divê Erdogan li şûna Gazze'yê pêşî Kurdan biparêze NİZAR AGRI
Nirxandinek balkêş ji rojnameya El-Heyat. R8

TENDURISTI
Ger tedbir neyê girtin dê di nava 5 salan de 85 milyon kes bimirin
WHO derbarê kanserê de hisyar kir. R8

ZANIST
Bazara muzikê cihê xwe hişt muzika dijital
Li cihanê roj bi roj bazara firotina cd'yan büyük dibe... R8

Weşanên HKMG:
HAWAR.NET hawarnet.com
MUZIKKURD muzikkurd.com
SİNEMAKURD sinemakurd.com
ZANISTUTEKNOLOJI zanistuteknoloji.com
KURDO kurdo.me | JINANE jinane.hk-mg.net
ABORINAS aborinas.hk-mg.net
HEMÖ www.hk-mg.net

Di kongeraya BDP de li aliyekî banga yekîtîya Kurdan, aliyeke din Tirkiyeyî bûn

Demîrtaş: Emê kelepçeyên destê xwe li stuyê zihniyeta AKP'ê bixin

AMED (Pêşketin)

Di Kongreya i'emin a Awarte ya BDP'ê de tuzuk ji hate guhertin. Kotaya jinê ku berê di tuzukê de cih digirt bi kotaya cinsiyetê hate guhertin. Li gorî vê guhertinê cihê ku jin lê zêde bin dé kota ji bo mérän bê bikaranin. Disa Diwana Serokatiyê ji kete tuzukê. Ev diwan jî ji du hevserok, du cîgirê serokên komê û alikarê serokê giştî pêk tê û her wiha di ser MYK'ê de ye.

Dîsa bi guherandina tuzukê re, meclisên jin û ciwanan dê xwesertir bibin. Namzetê Hevserokatiya BDP'ê Selahattin Demîrtaş, diyar kir ku armanca wan derbaskirina benda hilbijartînê ye û wiha got: "Em ê li hember politikayê AKP'ê yén li diji kurdan têdîkoşin. Di vê çerçovveye de politikaya me ya dema bê, xilaskirina gelé me ji belaya AKP'ê ye. Em li hizûra gelé xwe soz didin ku kelepçeyên li destê me xistine em ê derxinin û li stuyê ziyniyeta AKP'ê bixin.", Demîrtaş di berdewama axaftina xwe de bi lêv kir ku digel girtina parti ú

gelek rîveberêne wan ewan di siyasetê de israr kirine û wiha got: "Ev israra me ji xwe baweriya BDP'ê û gîredana bi demokratikbûnê ve nişan dide. Demîrtaş wiha axaftina xwe domand: "Ger em samîmiyeta we bibînin em ji bo muzakereye xurt amade ne. Ji mij ve dibe ku em guherandina Mâkezagone bixin rojeva xwe. Divê hun bi berdana zarok û DTP'îyen ku we girtine dest bi kar bikin. Ger hûn ji me bawer nekin herin ji Kenan Evren bibîrsin bê em bi infazan, girtinan, iškenceyan têk dicin an na? Heri baş dê ew ji we re bibêje.



Ger ew ji nebe herin ji Tansû Çiler, Doğan Gureş, Mehmet Ağar'an bibîrsin. Na ger hûn bi wan ji qani nebin ji niha ve cihê xwe li kéléka wan vekin."Li salona kongreyê, wêneyê siyasetmedarên kurd ên kelepçekirî hatiye daliqandin. Di bin wêne de ji gotinên 'Me bi derew û hileyên we nekari, ev ji bo me bû ders. Lé belê me li ber we serê xwe netewand, bila ew ji, ji bo me bibe dersek'. Beşdarêne kongreyê, bi cepik û siloganan, parlementer û şaredarêne BDP'yi pêşwazi kirin. Tevi BDP'îyan, nûnerên partiyêni siyasi, rîexistinê civaka sivil, nûnerên

gelek welatan, endamên Komîn Aşti û Çareseriya Demokratik ji tevli kongreyê bûn. Dema ku qasidên aştiyê ketin hundur, rasti coş û heyecaneke mezin a beşdarêne kongreyê hatin. Beşdar tim û tim di salonê de, siloganen ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û PKK dibéjin. Kişanak anî ziman ku niyeta AKP'ê nine ku pirsgirêka kurd bi awayeki aştiyane û demokratik çareser bike û xwe disipere hevgirtineke qirêj a di

'Ji bo ziman kampanyayan li dar bixin'

Demîrtaş got ku ew ji bo perwerdehiya zimanê zikmaki li héviya AKP'ê ji namînin û wiha got: "Em ne li héviya AKP ne ji li héviya dewletê diminin. Em bang li gel tevi dikin ku ji bo ziman seferberber bibin. Em bang li dê û bavan ji dikin. Zarokê xwe hînî zimanê wan bikin.

Di nav malê de bi zimanê zikmaki bi axifin. Navê zarokê xwe bi kurdî deynin. Weşan û rojnameyên ku li zimanê we xwedi derdikevin bixwinin û temaşê bikin. Divê xwendekarêne zanîngehan ji ji bo pêşxistina zimanê xwe kampanyayênu bidin destpêkirin. Ger pêdivi hebe divê li kolanan dersa ziman bê dayin. Rîveberên me yi heremî ji divê di hêla zimanê zikmaki de hesas bin. Hunermend ji divê pirtir hunerên xwe bi zimanê xwe pêşkêş bikin. HAWAR NET.com

KCK; Bila sîleh bi dualî werin rawestandin

AMED (Pêşketin)

KCK'ê ji bo çareseriya demokratik ya pirsgirêka kurd, gaveke din avêt. Serokê Konseyâ Rêveber a KCK'ê Mûrat Karayilan, bi beşdariya endamên Konseyâ Rêveber û Endamên Serokatiya Diwana Kongra-Gel, Deklarasyona Aşti û Çareseriya Demokratik eşkere kir. KCK'ê bal kişand ser hewldanê Tevgera Azadiya Kurd ji bo çareseriya demokratik û ani ziman

ku tevi van hukumeta AKP'ê û dewleta tirk siyaseta tesfiyekirinê dewam dikin.. KCK'ê, Deklarasyona Aşti û Çareseriya Demokratik, bi beşdariya Endamên Konseyâ Rêveber û endamên Serokatiya Diwana Kongra-Gel ji raya giştî re ragihand. Serokê Konseyâ Rêveber a KCK'ê Mûrat Karayilan beriya deklarasyonê eşkere bike, bal kişand ser gavêne Tevgera Azadiya Kurd avêteine.

KCK ya ku di çareseriya pirsgirêka Kurd a demokratik de bi israr e, Deklerasyona Çareseriya Aştiyane ya pirsgirêka Kurd pêşkêş kir.. Deklerasyon ji 4 xalan pêk tê... KCK ji bo çareriyê, xwest sileh duali werin bêdengirin, siyasetvanen Kurd werin berdan, weke gava yekemîn, Ocalan di heba malê de were ragirtin û hevditînê di navbera aliyan de were destpêkirin... KCK, her weha bang li derdorêne pêwendîdar kir da ku ji bo çareseriye, roleke çalak bigrin ser milê xwe.... AJANSAN



Barîna berfê li herêma Serhedê û başûrê Kurdistanê zêde dibe...



Pêleka barîna befrê bi ser çend deverên başûrê Kurdistanê de hatiye û heta niha çend dever hatine girtin. Çend deverên nêzîkî deverên befrayî jî, çûn û hatin lê zehmet e..

AMED (Pêşketin)

Deverên Haci Omeran, Rewandiz, Bêxal, Diyana, Şeqlawa û dora evan deveran, tije befr bûne û hina ji dibare. Belê li gelek deverên dinên herêma kurdistanê ji, ev befra han niha dibare û jêderên navxweyi ji didin xuyakirin, ku li parêzgeha Silêmaniye heta niv metreyê rabûye.

Herweha ev befra han li deverên Bazyan, Derbendixan, Qelaçolan, Çwarta, Şarbajêr û Qeladize ji dibare û hemû dever sipi bûne. Pêdivîyi nişandanê ye, ku sala derbasbûyi wek saleka hişk hat nasandin, ji ber ku befr û baranen wê kêm bûn. Belê ev sala me ya niha nerm xuya dike. Li bajarê Silêmaniye û derdora jî i navâ 24 seaten bori de li Silêmaniye 4cm û li Şarbajêr ji 19 cm befr bariye.

Li Bajarê Wanê, îsal meha Berfanbar û Rêbendanê weki bîharê derbas bû lê bi hatina Reşemiyê re berf û pûkê xwe nişan da. Ji ber berf û pûkê balafira ku navbera Wan û Enqereyê bi neçarı dada Mûşê. Ji ber barina berf seferen iro yêne balafirê hatin betalkirin û riya di navbera Wan û Culemêrg û Wan û Tetwanê jî de bi koteke réwiti te kirin. Li Wanê stûrahiya berf gîhişîye 40 santimê, ekibén şaredariyê dest bi malîstina rê û cadeyan kiriye. HAWAR NET.com

Li Xebûrê xebatêne dest pê kirin

Li ser agahiyên ku Yıldırım Begler ê ku bi salan di TSK'ê de xebiti û ji wan re karê wergerê kir û demek dirêj ji di Hêzên Taybet ên TSK'ê de xebiti dan, li nézi Deriyê Sinor û Xebûrê, li gel Çemê Hêzîlê xebatêne vekolanê hatin destpêkirin.

SIRNEX (Pêşketin): Di rojên bori de bi tevlibûna parêzeren karsaz Mehmet Bilgiç û Halil Birlik û Dozgerê Komarê yê Silopiyayê Nazir Kuş, li herêmê kifş

hatibûn kirin û xebatêne vekolanê hatin destpêkirin. Di saetên sibê de 5 karkeren Şaredariya Silopiyayê, kepçeyeke û 4 makineyên din ên kar bi tevli bûna

Dozger Nazir Kuş dest bi xebatêne vekolanê kirin. Serokê Baroya Sirnexê Nuşerivan Elçi, parêzer Nazan Birlik û Kamil Ozdemir ji tev li xebatêne bûn. HAWAR NET.com

Konferansa Neteweyî êdî ne dûr e

Endamekî Kongreya Neteweyî ya Kurd ragihand proje bo lidarxistina kongreya Neteweya Kurd hatiye amadekirin û dê di kongreyê de...

AMED (Pêşketin)

Endamekî Kongreya Neteweyî ya Kurd ragihand proje bo lidarxistina kongreya Neteweya Kurd hatiye amadekirin û dê di kongreyê de ji bili hilbijartina serkidayetiya seri ya xwe hebe. Kongreya Neteweya Kurd ku sala 1999'an li Brûsel Paytexta Belçikayê ji hêla çend kesayetiyêne kurd

ve hatiye damezirandin, bîryar bû sala derbasbûyi li Hewlêre bête lidarxistin Kameran Berwari axaftina xwe wiha berdewam kir, "Sala derbasbûyi ji ber zexten hinek welatên ciran wan nekarin kongré gîre bidin, niha tevi ku piraniya aliyan pêşwaziye li wê projeya me dikin, lê dema girêdana kongreyê ne diyar e.

Terora dewleta Tirk û Bêrîvan di rojnameya The Guardianê de ye

Terora dewleta Tirk a ser zarakan di rojeva raya giştî ya cihanê de ye

AMED (Pêşketin)

Bî hinceta beşdarikirinê di xwepêşandanekê de li Elîhê, zarokeke keç ya 15 sali ya bi navê Bêrîvan Z. Ji aliye daghehê ve bi 7 sal û 9 meh girtinê hate cezakirin. Bêrîvan digel malbata xwe li Stenbolê diji û wê rojê çûye serdana mala xaltika xwe li Elîhê, lê

ji ber ku nézi çalakiyê bûye ji aliye polisê bajêr ve hatiye destgirkirin. Bêrîvan ji aliye dagheha Diyarbekirê ve bi tometa 'pêkanîna tawanekê ji bo rîexistinê, bi 7 sal û 9 meh girtinê hate cezakirin. Ev nûçe doh di rojnameya ingilizi navdar The Guardianê de

jî cih girt.

The Guardian di nûçeya xwe de diyar kir ku li Ewrûpayê heri zêde li Tirkiyeyê mafêen zarakan têbîn pêşkîrin. Her wiha di rojnameyê de nameyeke Bêrîvan ku ji zindanê nivisandiye ji hatiye weşandin. HAWAR NET.com

Tirkiye dîsa bû "yekemîn"!...

Li gor raporê Dodgeha Mafê Mirovan ya Ewropayê di heyama sala 2009'ê de 2395 ceza derxistine. Li gor heman raporê di sala bihûri de zedetirin bînêkîrinê mafê mirovan li Tirkiye û Rûsyê hatine tomarkirin. Dodgeha her wiha 341 ceza li diji Tirkiyê de xistine. Her wiha li gor raporê, Rûsyê di pleya duyemin ya bînêkîrina mafê mirovan de té û di heyama wê salê de 210 haleten bînêkîrinê mafê mirovan gihiştine destê dodgeha.

"Divê kurdî wek zimanê perwerdehiyê bê pejirandin"

6'emin Konferansa Navneteweyî ya Kurd de peyamên girîng

BRÜKSEL (Pêşketin)
 Li paytexta Belçika
 Brûkselê 6'emin
 Konferansa
 Navneteweyî ya Kurd
 ku li Parlamento ya
 Ewropayê (PE) hate
 lidarxistin, qediya.
 Di beşa duhi ya
 konferansê de Mehmet
 Yüksel li ser navê
 KNKê daxuyaniyek
 da û wiha got:
 "Dewleta tirk bi
 kanaleke Tv, çend
 kursen ziman, li
 zaningeñ cend
 kursiyen lêkolinê,
 hemû girtiyen siyasi
 bêne berdan.



7. Divê pergala cerdevaniyê bête rakirin û tevdiren abori û sosyal jê re bêne girtin.
 8. Divê astengiyen li pêşya kesen bi daré zoré ji warê xwe hatine kirin, bêne rakirin. Divê ziraren mexdûren ser bêne dabinkirin û gundûn wan bêne avedankirin.
 9. Divê li herêma kurdan seferberiya gesedana abori bête destpêkirin.

10. Divê civakên kurd û tirk bi beramberi hev du efû bikin. Divê Ocalan û hemû girtiyen siyasi bêne berdan. Penaberên siyasi ji divê tekili jiyana siyasi bêne kîrin.
 11. Bi pêkhatina çareseriye divêt gerilla ji di çarçoveya qanûnen heyi de bibe hêzên asayıha herêmé an ji ji wan re ji statûyeke nû bête peydakirin. Encamnameya Konferansa kurd
 1-Divê Tirkîye operasyonê xwe yên li Kurdistan û İraqê rawestine. Operasyonê Tirkîye Herêma kurdistanê û aramiya wê tehdid dike.

Pêşniyareñ 11 bendi yên KNKê wiha ne:
 1. Divê makezagoneke demokratik bête çekirin. Makezagon, an divê li hember hemû nasnameyên ekniki nort be an ji hebûna nasnameya kurd di makezagonê de bête misogerkirin.
 2. Divê Komiteya Heq û Edaletê bête sazkarin da ku ev komite bûyerên li diji mafen mirovan û hiqûqa şer a navneteweyî lêkolin bike.
 3. Divê kurdji dibistana seretayı heta zaningeñ wek

zimanê perwerdehiyê bête pejirandin. Li warênu kufîsa kurdan lê zêde ye ji divê kurdî wek zimanê fermi yê duyem bête qebulkirin.
 4. Divê tu astengi li ber radyo, TV û çapemeniya kurdî neyêne danin.
 5. Divê qedexeyen li pêşya azadiya raman, baweri û derbirinê bêne rakirin.
 6. Divê Yasaya Rêveberiyen Herêmi ya demokratik bête derxistin û ev li ser esasê xweseriya demokratik bête bîcîhkirin.

2-Pevçûna di navbera dewleta Tirk û PKK'de encax dikare bi diyalojike politik a bi nûneren kurdan re bi dawi bê.
 3-Divê Tirkîye qanûna li diji terorê ya ku nûneren legal yên gelê Kurd kriminalize dike û dide girtin rojek zútir betal bike.
 4-Ji ber ku bi nûneren gelê Kurd re neketin diyaloge, hewildana rî li ber vekirina çareseriya pîrsa Kurd, bi ser neket.
 5-Divê Kurd bikaribin bi hemû parti, réxistin û saziyên xwe Newrozê bi dilê xwe piroz bikin. HAWAR NET.com



Dawiya celadên kurdan eve; Eli Kîmyewî jî hate idam kirin

Kujdarê bi sedhezarîn kurd û alikarê sereke a diktatora berê ya Iraqê Saddam Hüseyin, Eli Kîmyewî hate darve kirin. Berdevkê fermi yê hikûmeta Iraqê ragihand ku Eli Hesen Mecid naskiri bi Eli Kîmyawi hatiye idamkirin. Eli Hesen Mecid yek ji stûnên partiya Be'sa herrifiya Iraqê bû û pişti ku bajêre Helebê û xelkên evi bajéri da ber çekên kîmyayîn qedexekirin, bi navê Eli Kîmyawi hat naskirin. Evi tawankari bi ewan çekên qedexekiriyen kîmyayı, bêtirî pênc hezar (05.000) kurd kujt û bêtirî 15.000 kurd ji aware kir. Heta niha ji bandorê coraneyen (cor bi corê) bi karanina ewan çekan, di nava xelkê ewan deveran de mane. Malbatên Şehîdan li benda ve rojê bûn.

Ciwan Haco; Divê ji bo çareseriye bi PKK'an jî BDP re rûni

Rojnamevana Tarafê Amberin Zaman, bi hunermendê navdar yê kurd Ciwan Haco re li Basel a bajarê Swîsreyê beriya konserek wî pê re hevpeyvînek çekir

Hûn vebûna kurd ya AKP'ê çawa dinixîn? Li gor we pişti konsera we ya Batmanê a sala 2003an, pêşveçûnên erêni qewînîn?

- Belê hetmen, lê ne bes in. Tenê bi vekirina TRT Şeş'ê naqede. Lê, li gor min hem AKP û hem ji Tayyip Erdogan bi dilsozi dixwazin yê meselê çareser bikin. Li hêla din, hin ali ji hene ku ji şer bêslî dîbin. Ew kes aşitiyê naxwazin. A rasti, heger dewleta tirk aşitiyê bixwaze, wê qet ji ne zehmet be.

Ango hûn dibêjin, di navbera hikûmet û dewletê de ferg heye?

- Helbet heye, hûn ji vê yekê dizanin.

Baş e, divê ci bê kirin? Formül ci ye?

- Di seri de divê realiteya PKK'ê bê pejirandin. Divê bi PKK'ê re li ser maseyekê rûnin. PKK, perçeyek gelê kurd e. Çareseriye ku gelê kurd nedîn ber çav, ne çareseri ne. Li Tirkîye 20 milyon kurd hene. Divê daxwazên kurdan li ber çav bêne girtin. Eðî politiqayen asimilasyonê nameşin. Li gor min, çareseriya heri maqûl federasyon an ji otonomi ye.

Kes êdî qala serxwebûnê nake. Kurd, dixwazin bi tîrkan re bijin.

Ji bo beşek gelê kurd dibe ku tiştén hûn dibêjin rast bin. Lé rayagîşti ya tirk bi tu awayî napejîrîne ku bi PKK'ê, an ji bi Ocalan re bê rûniştin. Ew dewleta ku hûn qala wê dîkin, ew ji napejîrîne. Ji bo hikûmetê ji tişteke weha intxareke stiyasi ye...

- Demekî li ser heman maseyi rûniştina Yaser Arâfat û Israîliyan ji ji bo insanan wek xeyal bû. Temam, bila ne bi PKK'ê re, bi DTP'ê re rûnîn; lê DTP'ji girtin. Pêşveçûnên demen dawi, dibe sedem ku dilsoziya AKP'ê bê guftûgokirin.

İle federasyon an ji otonomi pêwîst e gelô? Heger Tirkîye bibe endamê yekîtiya ewrûpayê û demokrasîya wê ya pêşketî wê nikaribe daxwazên kurd û tîrkan pêşwazî bike?

- Belê, çima na? Tirkîye yekîtiya ewrûpayê bi rasti ji wê têkûz be. Tenê bila herkes azad be.. Ji bo dewama hevpeyvînek HAWAR NET.com

Êdî hemberî gelê Kurd ferqa dewleta Tirk û Ewrûpayê nemaye



AMED (Pêşketin)

BDadgeha Mafen Mirovan a Ewropayê doza di çarçoveya serîdânêni welatiyên kurd ên ji bo bi tipen kundi nivîsandina navan a li ser nasnameyan bi encam kir û pêkanîna dewleta tirk a li hemberî ziman û alfabeşa kurdi di cih de dit Dadgeha Mafen Mirovan a Ewropayê (DMME) ji doza ji bo

nivîsandina 'elewîtiyê' ya li ser nasnameyê dewleta tirk mehkûm kir.

Yekîtiya Ewrûpa di pirsgirêka Kurd û Kurdistanê de ne wêrek û dirust e Divê kurd bo haydar kirina derbarê pirsgirêka Kurd û Kurdistan bi her avahi di hemû alîyên wî li YE bi avayekî rîkûpek û stratejik karen diplomati

bimeşîne û divê medya û ragihandina Kurdi bi giştî û rîveberiya Kurdistanê Azad, hikmeta kurdistan rasterast têvi wan xebatan bin. Eşkereye ku ger Kurd daxwaz nekin, hewl nedîn û bi yekrezi tevnegerin û hêz xwe mezintir nekin tu hêz we bo Kurdish newlîn berfirehtir nedîn. HAWAR NET.com

Borsaya Kurdistanê bi resmî hate vekirin

Pêncsemâ borî li Otela Sheratonê li Hewlîrê di civineke rojamegeriyê de bi awayekî resmi vekirina Borsaya Kurdistanê hate ragihandîn ku her yek ji hikûmeta herêmî kerta taybet tê de xwedî piş in û ji %13ê pişka wê ji bo welatiyan hatiye terxankirin. Bîrêveberê Borsaya Kurdistanê Ebdullah Ebdulrehman di cîvinê de got: "Ev cara yekê ye li herêma Kurdistanê bi rezamendîya hikûmeta Iraqê Borsaya Kurdistanê tê vekirin. Pişka hikûmeta herêmî di borsaya û de ji %20e ye, pişka welatiyan ji %13e ye û pişkîn din ji ji bo şirket û kerta taybet e." Ebdulrehman got: "Heta nuha ji bili jimarek ji bankayê Kurdistan, Iraq û çend zaningeñ taybet, pişka 19 şirketên mezîn, wezareta darayı, wezareta karûbare şehîdan û enfalkirîyan, odayen bazırganiyê yê Hewlîr, Dihok û Silêmaniye di borsaya û de hatiye tomarkirin.

Li gor anketan dengê BDP (DTP) zêde bûye

Dengê DTP derketiya derodra ji %8'ê. Li gor şirketa lêkolinê a Tirk A&G dengê DTP ku hatiye girtin û niha bûye BDP ber bi zêde bûnê ve dice. Li gor anketê dengê DTP nézi %1 zêde bûye. Li gor anketê ger iro hilbijartinek were pêk anîn rewşa partîyan wisa ye;

AKP: % 33

CHP: % 22

MHP: % 20

DTP(BDP): % 8

TDH(Partiya Mustafa Sarigul): % 7



HAWAR NET / NÜÇE Ü AGAHÎ

TU LI KÜ Bİ, NÜÇE LI WÊ DERË YE

hawarnet.com

Kurdî û Kurdistanî

Li pêşîya çareseriya pirsgirêka Kurda astenga herî mezin CHP ye

PÊŞKETIN

Dijberiya CHP a hember Kurdan heri dawi bi axaftina faşizan, na alikaré serokê CHP'ê beriya 3 mehan hate rojevê.

Onur Oymen 10 Mijdara 2009'an li Meclisa Tirkîyê derbarê mijara pirsgirêk Kurd de li ser navê CHP'ê axaftinek kiribû ú weke rébaza çareseriye ji, komkujiyên Dêrsim ú Piranê nişan dabû. Ev daxuyaniya Oymen ré li ber rabûna hêrsa gelê Kurd vekir bû. CHP di pêvajoya ku heri zêde çareseriya pirsgirêka Kurd hatibû rojevê roleke xirab list ú pêvajoyê xetimand. Her wiha hevkariya CHP û arteşa Tirk ji tézanin. CHP ji ber politikayê xwe yên dij- Kurd li bajarê bakûrê Kurdistanê edi

nikare dengan bistine lê divê zihniyeta CHP a kemalist ú dij-Kurd di her qadê de were deşifre kirin. CHP dijminê herî esasi ya Kurdan e. Wek té zanin hemû partiyan Tirkan û AKP û CHP ku di tu mijaran de li hev nakin wexta ku mijar Kurd ú Kurdistan be li hev dîkin. CHP ku demeke li herêmê partiya herî bilêz bû, bi sedema politikayê têkildari pirsgirêka kurd, di hilbijartîn 22'ye tîrmehê de ji aliye gelê herêmê ve hate cezakirin. CHP ku weki pirsgirêka 'ewlekariyê' nêzi pirsgirêka

kurd dibe ú ber bi xetek nijadperest ve çû, li herêmê ji MHP'ê ji hin zedetir paş ve ket. CHP ku ji ber derba xwar li herêmê ketiye nava hewldanênu, di 32'yemin Kongreya Giştî ya CHP'ê ya di 26-27'ê nisanê hate lidarxistin de, heviyên derdorênu ku çav li ré bûn der barê pirsgirêka kurd de hin vebûnan bike, vala derxist. CHP ku her çiqas partiyekî qaşo "çepgir" be ji bi politikayê xwe yên faşist û kamlist û diji Kurdan têna nasin û heman demê de nûnerê veşarti ya hêzén militarstîn.

Demokratize bûna Tirkîye an ji pêşketina bir ú baweriyêne dervey kemalizm ú Tirkperestiyê an ji pêşketina Kurdan li Kurdistanazad û bi dest xistina hin mafêni biçük li bakûrê Kurdistanê hêzén nijadperest, arteşa Tirk, dijminê Kurdan, kemalistên faşist, çeteyên tari, derdorênu militarist ú hemû hêzén ku ji berjewendiyê xwe winda dîkin dixe nava livûtevgere.

CHP û baykal her dem bi eşkeriya dijminaya xwe hember Kurdan eşkere kirin. CHP çend meh berê nerazibûnê xwe yên li hemberi mijara Kerkükê de ji diyar kiribû ú li kurdan gefan xwari bûn ú daxwaza dagir kirina Kerkükê anî bûn ziman.

Armancanê rastî ya CHP

Armancanê Deniz Baykal ú dijberen Kurdan; • Ji holê rakirina destkeftiyê Kurdan li bakûrê Kurdistanê û careki din bilind kirina nijadperestîya Tirkî ne.

- Rûxanidina Dewleta Federe ya Kurdistanê ye ú pêşî le girtina pêşketinê li rojhilate Kurdistanê ye
- Xera kirina aramiya li bakûrê Kurdistanê ye.
- Pasifize kirina Kurdan di her waran de

• Ger nikaribin Dewleta Federe ya Kurdistanê hilweşin CHP dixwaze ku bi weşanê Kurdi ú bi vergirtina xwendekaran ji başurê kurdistanê ú bi daxil bûna abori ku gelê başurê kurdistanê li diji hikumeta Kurdistanê sor bikin ú aloziya navxweyi derxinin ú dewleta Tirk di çavê kurdan de mezin nişan bidin ú Kurdan bigrin bin bandora xwe ú di warê diplomatik ú siyasi de ji ser Kurdistanazad bi bandor bin.

Fâşistên Tirk bi gavê wisa dixwazin ku Kurdan bixapinîn ú bigrin bin kontrola xwe.



Ger AKP dixwaze bi rastî pêşî li ordiyê bigre divê ji nû ve vegere ser bûyera Şemzînanê!...

HAWAR NET.com

Li Tirkîyeyê di "Plana Balyozê" ku ji aliye Rojnameya Tarafê ve hate teşîrkirin de dihate plankirin ku TSK di darbeya ku dê di sala 2003'ê de pêk anîbana hê rojevê de mijara yekemin e. Bêguman pêşî le girtina hemonyaya ordisya Tirk ú asteng kirina darbeyan ji bo Kurdan ji mijareke giring e. Lé AKP xwe wek qehermanê demokrasiyê nişan dide li kirinên AKP ên li Kurdistanê berojavî ve yekê ye. Yek ji nişaneyê dûrûtiya heri mezin a AKP yê bûyera Şemzînanê ye. Di Şemzînanê de AKP ser bûyerê girt

Endamên JİTEM'ê yên êrişkar Veysel Ates, Ali Kaya ú Ozcan İldeniz li ser súc hatin zevtkirin. Lé tevi vê yekê ji, li şuna ku werin dadgehkirin, rayedarên dewletê xwedî li van kujeran derketin

Di 9'ê sermawea 2005'an de de li diji Pirtûkxaneya Umut a li Navenda Kar a Ozipek, êrişek bombeyi pêk hat. Di êrişê de Yilmaz Kaya mir, xwediyê pirtûkxaneyê Seferi Yilmaz ji birindar bû. Şeniyên navçeyê kiryaren bûyerê qefalt ú radesti hêzén ewlekariyê kiri bûn. Di seyareya van kesen ku navê wan Astsubay Ali Kaya, itirafkar Veysel Ates ú Ozcan İldeniz e de, çek, kroki, nexše, listeya navên kesen ku dê bêne kuştin ú ajanda derketi bû. Astsubay Kaya, li ser navê fermandarê demê yê Kolorduya 7'emin Yaşar Buyukanit, belgeyên sexte çekiriye ú di lêpîrsina nêzi 100 karsazi de cih digirt. Dewleta Tirk xwest ku serê vê meseleyê ji bigre ú bide ji bir kirin. Lé milletê Kurd ser êrişen dijminen Kurdan û hevkaren wan dijminan nerazibûnê xwe nişan dan. Di diroka Tirkîyeyê de bi sedan bûyerên wek

Şemzînan çê bûye ú her carê Dewleta Tirk ser van bûyeran girtiye. Dewleta Tirk nexwast ku bi vê bûyerê készeyâ Kurda carekî din were rojevê. Kornara Tirk xwest ku vê bûyerê weki bûyerêkê minferet nişan bide. Le bi ser neket. Kurd ji berê zedetir têkiliyê berjewendixwaz ú şoven navbera arteşa Tirk, polisên Tirk, sermayedar, medya, dewleta kür û siyasetê dizanin. Terora dewleta Tirk li Şemzînanê di ser guneh de hatibû zevtkirin ú teroristên dewleta Tirk 36 sal eza vergirti bûn dadghela bilin cezayen wan teroristan di meha gulanê de betal kir.. Hikumeta AKP ku gotibû dê bûyeren Şemzînanê bê roni kirin di nava du salan de bi temamî ser bûyerê girt ú terorsitên xwe ji wek bê suc nişan dan ú bûyerê weke bûyereke munferit nişan dan ú sücdar serbet hatin berdan.

Darbeya rasti li Kurdistanê ye
Bi mehane êrişen ser Kurdan gav bi gav zêde dibe. Kurd têne kuştin. Partiya wan té girtin. Şaredar ú sisetmedarên wan bi kelebceyê kiranê té girtin, navê zarokên wan té qedexe kiran, ji ber stranê Kurdi ceza ú lêdan dixwin ú êrişen cur bi cur. Zext ú operasyonê dewleta Tirk BDP ú saziyên kurdan dewam dike. Li diji operasyona ser BDP nerazibûna gelê Kurd mezin dibe. Li aliyeke planen derbeyê derdikeve holê ú AKP wan planan ji berjewendiyen xwe bi kartine. Li aliyeke din bi rojane li Kurdistanê derbeyeke giran ji aliye AKP ve ser Kurdan pêk tê.

AKP bo berjewendiya xwe hewldanê eskeran bikartine
Pişti li diji AKP doza girtinê hate vekirin ú derdorê militarist ú şoven AKP xistin tengasiyê ú imaja AKP xirab kiran, niha AKP ji nû bi dest xistina héza ú bo çavîrsandina wan dersoran hin beşen çeteyle Ergenekonê deşifre kir. Lé wisa xuya ye ku AKP vê çeteyê bi temamî ji holê ranekê ú dewleta kür a Tirk ú çeteyen bi rengi her hebin. Jixwe AKP guhertina helwesta xwe hember Kurdan ú êriskirina ser gelê kurd dide diyar kiran ku naxwaze şerê li bakûrê Kurdistanê bi dawi be.

HÊZAXÊZ



Gelo meseleya Kerkükê hate çareser kirin?!

REBIWAR KURDO / HAWAR NET

Serokê Kurdistana Federal cü Emerîkayê ú bi Obama, Hilary Clinton ú bi gellek rayedaren DYE'yê hevdîtinan pêk anî. Hate idia kirin ku beranberi sozen DYA'yê yên derbarê Kerkükê de kurdan qanûna nû ya hilbijartinan ku hejmara parlementerîn kurd a li parmenena navbeni bisinor dike qebûl kiran. Serokê Beşa Kurdoilojiya Enstituya Zanyariya Rojhîlat Olgai Jigalina diyar kir ku di hewildan ú diplomasîya ku li ser pêvajoya hilbijartina li Iraqê pêk té de di nav Hewler ú Bexdayê de bazarên pir giring têni kirin. Li Iraqê ji ber ku di parlamentoya Iraqê de ji kurdan re der

dora 60-65 kursi hatin vegetandin kriz derketibû. Tê gotin ku bi hewildana Amerikayê kurd hatine aştkrini ú di berdêla vê de ji kurdan ji bo diyarkirina rewşa Kerkükê ji ji piştigiriya Amerikayê misoger kiriye. Jigalina li ser mijarê gotara bi navê 'Rewşa Hilbijartina Giştî ya Iraqê ú Kurdan' di malpera internetê ya bi navê iimes.ru yê de weşand. Di vê gotarê de diyar dike ku di parlamentoya Iraqê de hejmara kursiyen kurdan hate kêmkirin

lê der barê xalêne Makeqanûna Iraqê yên 140 à 142'ye mi de ji Washingtonê qewl ú ewlehiyên giring bidest xistine. Jigalina mijara jorin wiha vedibêje: "Ev ji té vê wateyê ku berya ku Amerika leşkerê we ji Iraqê vekiye dê sinorê başûrê Kurdistanê berfire bike. Kontrola nefta Kerkükê bide destê kurdan." Jigalina destnişan dike ku ji ber bazara li ser vê mijarê pîr dijwar derbas bûye roja hilbijartînê ji 16'ê çile heta 6'ê adara 2010'an hat talokirin.

Darbeya rastî li bakûrê Kurdistanê ser Kurdan pêk tê

Bi rojane li Kurdistanê derbeyeke rasti ji aliye AKP ve ser Kurdan pêk tê. Li Tirkîyeyê İdirê di 21'ê rêtbandanê de şaredarê Partiya Aşti û Demokrasiyê (BDP) Mehmet Nuri Güneş hate kelepce kiran. Di dozgeriyê de ifadeya 12 kesan hate girtin ú bi merema girtinê ew hênatîn Dadweriya Nobedîr. Rûniştin berdestê sibêhe iro temam bû û derheqi Şaredar Mehmet Nuri Güneş, Serokê Bajîr û BDP'ê Şebap Çelik, Serokê Sendikaya Hoşhaber yê berê Nusret Aras û endamên BDP'ê Mehmet Haşimoğlu, Mecit Baştas, Abdulbahri Tendik, Mehmet Güven û Aziz Çam ji bi idiyaya "endamên rêtixtinê ne" biryara bendikirinê hate dayin. 4 kes ji bêyi ku girti bimînin dê bêne darizandin.

BDP'ye ku hatin bendikirin hênarîn Girtixaneya Girti yê İdirê. **Darbeya rastî li Kurdistanê ye**
Bi mehane êrişen ser Kurdan gav bi gav zêde dibe. Kurd têne kuştin. Partiya wan té girtin. Şaredar ú sisetmedarên wan bi kelebceyê kiranê té girtin, navê zarokên wan té qedexe kiran, ji ber stranê Kurdi ceza ú lêdan dixwin ú êrişen cur bi cur. Zext ú operasyonê dewleta Tirk BDP ú saziyên kurdan dewam dike. Li diji operasyona ser BDP nerazibûna gelê Kurd mezin dibe. Serokomarê Tirk Abdullah Gul digot ku isal wê pirsgirêka kurd bê çareserkirin ú "Dê tiştên pir baş" çêbin. Mixabin di nava

kurdan de ji gelek ali bi van gotinan hatin xapandin ú di wê baweriyê de bûn wê pîrsa kurd li Tirkîyeyê bê çareserkirin. Pişte AKP "nexser" ya xwe ya çareseriye diyar kir. Di plana AKP tu daxwazên serke yên Kurdan tune bû. Wek perwerdeya bi zimanê Kurdi, berifrehtir kirina mafêni rêvîbiriyen herêmi ú hwd.. Li aliyeke planen derbeyê derdikeve holê ú AKP wan planan ji bo berjewendiyen xwe bi kartine. Li aliyeke din bi rojane li Kurdistanê derbeyeke giran ji aliye AKP ve ser Kurdan pêk tê.

Sînemaya Kurdî heye, sektor tune ye...

Ji bo ava bûna sektora sînemaya Kurdî pivê pêşî çerxa abori û reklamgeriyê di medyaya Kurdî de derkeve holê...

Serhad B.RÊNAS

Bî Konferansa Sînemaya Kurdî a Amedê de ku beri meñeke hate li dar xistin, pîrsa "Gelo Sînemaya Kurdî heye an na?" careke din hate niqâş kîrin. Pîrsen bi vi avayî paşerojê de bo medyaya Kurdî an ji weşangeriya Kurdî ji dihate rojevê. Béguman pîrs eyni be ji armanca pîrsina pîrsen wîsa diguhere. Hin kes ji bo ku çanda Kurdî pêşkeve, hin kes ji nezaniyi xwe, hin kes ji ber nexweişeri herî mezin a Kurdan a "xwe bîcûk ditinê", hin kes ji bo bigûk xistina Kurdan pîrsen wîsa tinin rojevê. Heta salêni dawî ji dewleta Tirk ji digot zimanê kurdi heye an na? Niqaşke bêwate a bi pîrsa

"Sînemaya Kurdî heye an na" tê kirin. Ger ewqas film hatine kişandin, ewqas derhêner xwe weki derhênerê Kurd û filmên xwe ji wek filmên Kurdî bi nav dikin, her sal gellek festivalên sînemaya Kurdî bê li dar xistin û gellek serkeftinê mezin ji bidest dixin bêwateyiya niqaş sinemaya Kurdî heye an na ji derdikeve holê. Filmekê zimanê ku tê bikaranin Kurdî be, derhênerê vê filmê Kurd be an ji ew film bi rihe Kurdeyatî û girêdayî ev film béguman filmeki sinemaya Kurdî ye. Her ji ci be nav Kurdan de kesen xwe pîr jîr û "welatparêz" dibinin û her tiştî de xwe weki navend û pispor nişan didin heye û ger mirovek ji wan re bipirse; Gelo tu derbarê weşangeriya Kurdî de ci difikir? Bersiva wan amadeye; Ci! Ma weşangeriya Kurdî heye? Divê em xwe nexapinîn. Yan ji di derbarê Weşangeriya Kurdî, wêjeya

Kurdî, sinemaya Kurdî, muzika Kurdî, zimanê Kurdî de ji heman tişt dibêjin "Em xwe nexepinîn rewşa me gelek xirabe, tiştî han hin ne pêk hatine"... Bi bersivén xwe kesayatiyên xwe yê eciz ji nişan didin ku her wiha ewqas korin ku pêşketina behit ku di van zosalan de pêkhatîni nabinin. Şiroveyen wîsa béguman têvkariyek nadî pêşketina ziman, weşangeri, sinema, medya û hwd. en Kurdî. Li aliyekei din nebûyina dewleteke Kurdan an ji nebûna rêvebiryeke navendi a Kurdan û inkar û hewlén imha Kirina gelê Kurd a dewletén dagirker (ji xeyni Iraq) rî li hilberina çandî a profesyonel ya Kurdî asteng kir. Di weşangeriya ditbarî û bi giştî medyaya Kurdî de çerxa aboriyê pêk nehat. Sanayiyeke xûrt a Kurdî tune ye.

Sîrketên heyi li Kurdistanê ji xwe dûri zimanê Kurdî xistine. Anglo bazara zimanê Kurdî tune ye. Ger her sal bi dehan film neyêne kişandin, ger her sal li gel filmên hûneri ku sinemaya Kurdî di festivalên navneteyî de temsil bike, filmên bo "temâse kirin" yani filmên ku bala hemû beşen cîvakê bikşine û bi produksiyon û naveroka xwe bâle bikşine neyêne kişandin em nikarin behsa sektora sinemaya Kurdî bikin. Li Kurdistana Federal pêşketina aboriya Kurdî û hewlén hikumeta Kurdistanê bo pêşketina sinemaya Kurdî û derkettina çerxa reklamê di medya yê de û li bakur ji hêdi hêdi zêde bûna hestiyâra ser zîmîn û pêşketinê di warê siyasi û destkeftiyen nû héviya ava bûna sektora sinemaya Kurdî mezin dike.

Ji bo ava bûna sektora sînemaya Kurdî - Divê pêşî çerxa abori û reklamgeriyê di medyaya Kurdî de derkeve holê. - Divê filmên Kurdî bi produksiyoneke baş bêne kişandin. - Divê delfeta medyayê bi avayekî berfirê were bikaranin û bo nsandina filmên bi riya reklamê hewlén zêdetir bê dayin. - Divê akademyeke sinemaya Kurdî ku hemû perçeyen Kurdistanê hembêz dike were avakirin. Avetina gavêni wîsa û hin gavêni din wê rî li pêşketina sinemaya Kurdî bilîz tir bike û her wiha rengin bûn û pir cureyiya sinmeya Kurdî derxe holê. Ev yek ji wê bibe sedem ku sinemaya Kurdî li aliyekei di warê hûneri de pêşketi be û li cihanî filmên Kurdî bi merqeyâ "sinemaya Kurdî" were naşkirin û li aliyekei din ji sinmeya Kurdî di warê populer de ji bersiva ixtiyacêن gelê Kurd û rastiyen sedsala 21'emin bide.

serhadrenas@yahoo.com

Hin kurd ji koletiyê hez dikin

ZINARÉ XAMO

Cigirê Serokê Giştî yê CHP-ê Yilmaz Ateş, di hevpeyivina xwe ya bi (AKNEWS) da ji serokê xwe Deniz Baykal bêtir li diji perwerdeya bi zimanê kurdi derdikeve û dibêje daxwazeke wiha perçekirina miletê tirk e. Dijberiya Deniz Bayikal ya li hember perwerdeya zimanê kurdi meriv fêm dike, cimki mîrik "tirk" e û birêvebireki dewletê ye. Lema ji ne abnormal e ku mîrik neyartiyekurdan bîke. Lé Yilmaz Ateş xwedégiravî kurdeki Dérsimî ye, loma ji meriv hêvi dike ku genebe ew weke tirkîkî faşist li diji zimanê miletê xwe dernekeve. Lé bira derneketin li wir bîmine, mîrik ji nîjadperestekî tirk bêtir li dijî derdikeve û dibêje tiştîki wiha nayê qebûlkirin. Min digot belki di nava CHP-ê da kurdê ji xiret û kurdperweriyê heri şuştî û zilamê tirkan tenê Kemal Kılıçdaroglu ye, lé pişti ku min hevpeyîn Yilmaz Ateş xwend, min dit ku ev texminâ min şaş bûye, yêne weke Kılıçdaroglu û belki ji wi ji hin xerabtir pîr in. Yilmaz Ateş sebebê têkçûna CHP-ê ya li Kurdistanê bi siyaseta CHP-ê ya derbarê mesela kurd ve girê nade, dibêje: "Na, tu tesira wê tuneye. Wek zarokê wê herêmê ez dibêjim ku em perçekirinê qebûl nakin, em dixwazin di nava yekitiyê da bijin. Ü ji bo ku em bibin yek ci pêwist be emi bikin." Wey xwezi tu ne zarokê wê herêmê bûya... Wek tê ditin, mîrik li dijî "perçekirinê" yanî li dijî azadî û serxwebûna miletê xwe ye û ji bo ku kurd negîhîn mafêne xwe yê netewi, bîhelin û bibin tirk, bi gotina wi, ji bo ku "bibin yek" ci pêwist be ewê bike... Ev ji tê wê maneyê ku bi zorê be ji ewê kurdan bike tirk. Ev şîara, "dengê xwe ya bide ola xwe ya ji bide zimanê xwe" nayê bira min, lé kî ev şîar derxistibe bi rastî ji ew kurdeki ji dil kurd bûye. Lé Yilmaz Ateş bûye xulamê tirkan li dijî vê şîariyê, bi ya wi be dibê kurd dengên xwe nedîn ferdîn ji qewmê xwe û ola xwe, bidin neyar û celadên xwe, bidin qatîlen bav û kalên xwe.

Diyar e insan ku carê kumê bêxîreti û çavpaniyê da serê xwe, dikan heta tu bixwazi bêhaya û bêrû bibe, bibe zilamê dijmin û li dijî gelê xwe şer bike. Li gor ditina Yilmaz Ateş, li Tirkîyê kurd, ereb, laz tunene, herkes tirk û mecbûr e bibe tirk, cimki Ataturk wîsa gotiye. Atêş dibêje, "Di şerî rizgariyê da kurd, tirk, ereb û laz hebûn. Dema M. Kemal welat rizgar kir got," Ji damezirinerên Komara Tirkîyê ra miletê tirk tê gotin." Yani tu ji ci miletî dibî bibi, dixwazi ereb ya ji kurd bû, tu mecbûr i bibi tirk. Ü Yilmaz Ateş me yê Dérsimî ji vê fermâna M. Kemalî arnawîn iro ji gelê xwe ra dubare dike, dibêje, Ataturk wiha gotiye, dibê hûn ji qebûl bikin. Diroka dînyayê û têkoşina gelan nişan daye, li welateki heta ku zilam û destikên dijmin xurt bin û biwîribin hevalbendîya bi dijmin ra eşkere biparêzin serkeftin gelki zahmet e.

Loma ji li kîjan welati dibe bila bibe, ji bo serkeftina li hember hêzîn dagirker divê pişta destik û hevalbendîn hundur were şikandin, ji bo ku nikanîbin dijmin li ba xwe şarge bikin. Li ser perwerdeya bi zimanê kurdi ji Yilmaz Ateş efendi xwe gelki aciz dike û dibêje: "Eger hûn bixwazin miletîki şerke bikin dibî de hûn zimanê wan perçebûna. Niha PKK bi zimanê zikmaki perwerdeye dixwaze û dibêje bila aleke me ya cuda hebe û hêzîn me yêne ewlekariyê cuda hebin. Ev yek tê wateya dewletek cuda. Ma herkes reben e tenê PKK biaqil e." Ew meriveki pir "reben" û "kêmaqil" e lé haya wi ji wi tuneye, lema ji belangaz û evdalê Xwedê xwe "reben" nahesibine. Kuro pişti ku tu perwerdeya bi zimanê kurdi ji weke mafeki gelê xwe nabini, ma édi ji te rebentir û bêaqiltir ki heye? Ji ber ku wi carê bindesti û koleti qebûl kiriye, loma ji daxwa perwerdeya bi zimanê kurdi, aleke cuda û hêzîn kurd yêne ewlekariyê qebûl nake, viya weke perçebûna Tirkîyê dibîne. Bidestxistana van mafan layiqi gelê xwe nabine. Ü dûra ji dibêje, heger kurd van mafan bidest xin, ewê bibin xwedî dewleteke cuda. Ev yek ji weke kurd camêr ditirsine... Ü ji bo ku kurd di pêşerojê da nebin xwedî dewleteke serbixwe, dibê zarokê kurd bi zimanê diya xwe nexwinin, dibê kurd nebin xwedî al û hêzîn ewlekariyê. Heta ku ruhköleyen wiha di nava me da hebin serkeftina kurdan gelki zor zahmet e....

Ji Çapameniya cîhanê du analîz

HUSEYIN ABDÜL HUSEYIN

The National

Di rojnameya The National ku di Abu Dabi'ye de tê weşandin ser Kurdan gotareke hate weşandin. Gotar ji aliye Huseyin Abdül Huseyin'ê ve hatiye nişvan din. Em ji bo we kurteya gotarê diweşînin;

Kurdîn Iraqê ku bi salan hemberi zilma Seddam sekinin édi ji bo Ereban bûn modelek. Rêberên Kurd pişti dagirkirina Iraqê statukuya navneteyî baş fam kirin û heta li Bexda'ye diktatoren tune be dev ji serxwebûnê berdan û dest bi derxistina tama demokrasiyê kirin. Li rojhilata navin çirokên serkeftinê û derbarê dewlet avakirinê de bi kêmîn. Hin minakên baş hene wek Emîrtiyen Ereb, Bahreyn, Qadat an ji

Urdun... Lé ji wana heri balkêş Kurdistana Iraqê ye. 25 sal berê Kurdîn Iraqê li bi komkujiyeke mezin rûbirû man. Seddam bi oprasyona Enfal ê 150 hezar Kurd qetl kir.....

..... Ü édi Kurd fam kiribûn ku ittifaq bi DYE'ye divê heta kîjan sinorê be. Di sala 2003'an de Kurd pistgiriya DYE kirin. Ü Ji nû ve ji Bexda'ye re nézik bûn. Beşdari Iraqê bûn lê di herêma xwe de xwesiya çandî, siyasi û abori girtin bin garantiyê. Kurd dema xwe heffa xwe anîna ji dev ji berdانا serxwebûnê winda nakin.

Formuleke nû peyda kirin. Heta ku li Bexdayê rêvebiryeke demokratik hebe Kurdistana Iraqê wê wek perçeyekî Iraqê bîmine. Lé eger li Bexdayê diktatoren derkeve holê wê ji Iraqê vezetin. Pêşengên Kurd li dijî şidetêne û tundiye bi her avahi şermezar dikin. Béguman inşaya dewletê ya li Kurdistana Iraqê nê békemasiye. Lé li rojhilata navin ceribandina heri balkêş e. Ev tecribeye Kurdan béguman divê ji bo Ereban bibe minakeki

Divê Erdogan li şûna Gazze'ye pêşî Kurdan biparêze


NÎZAR AGRI



Gotar ji aliye di rojnameya Erebî ya El-Hayatê doh hate weşandin. Em ji bo we kurteya gotarê diweşînin; Ger mirov li neheqi û zext û zilma ser Kurden li Tirkîye bide miqayeseyê bangê Erdoganê a edelet i wijdanê a ji bo Gazze'ye bê mane dimine. Dewleta Tirk hê ji ji Kurd û Ermeni û Suryaniyan leborin nexwestiye. Serokwezirê Tirk Teyyip Erdogan di her fîrsendê de zilma İsrailê a ser Filistînî şermezar dike. Béguman rexne kirina İsrail an ji Guantanamoyê tiştîki pir baše. İran û Tirkîye bi heman şeweyî tevdigrin. İran ji Emîriyê û İsrailê rexne dike lê li aliyeke din

Iraq, Libnan û Filistîn tevlihev dike, li Kurd û Ereb û Ezeriyê li iranê zilm dike, zexten xwe mixalefeta li iranê her roj zêdetir dike. AKP ji di eyni rewşê de ye. Dewleta Tirk bi milyonan Ermeni û Suyanîyen ku qetl kir lê vî tiştî hê qebûl nake û leborin naxwaze. Edelata ku Erdogan behsa wê dike ferz dike ku dewleta Tirk ji ber wan qelimam leborin bixwaze. Wexta Kurd İsrail Xazze'ye bombe baran dikir. Enqere bi balafirê ku ji İsrail Ú DYE kiri bû Kurdistana İaqrê bombebaran dikir. Dewleta Tirk mafen heri rewşa en gelê

Kurd hê ji nasnake. Dûriita dewleta Tirk bi hejmartinê naqede. Wisa xûya ku dewleta Tirk encax dikare qebûl biek ku Kurd bi zimanê xwe bikaribin biaxfîn. Artêsa Tirk di 20 salên dawîn 30 hezar kes kuş. 4 milyon Kurd ji warênen xwe koçber bûn. Herêman Kurdan bi salan di bin dagirkeri û rewşa awarte ma. Lé ne Erdogan ne ji partîyê wê devênen xwe venekirin. Tu kes edelet û mafan na anîn bira xwe û li hemberi kuştina zarakan û querina dayikan tiştî negotin... (Werter: HAWAR NET.com)



Îran him dibêje "li hevhatin" him jî fuzeyan dişîne

Îran li aliyekî dibêje dewlemend kirina uranyûmê dikare li
dervey îranê pêk bîne li alivekî din jî fuzavan diceribîne

AMED (Pêşketin) : Îran dev ji gavên xwe yên xeter benade

benade..
Îran li aliyekî dibêje dewlemend kirina uranyûmê
dikare li dervey iranê pêk bine li aliyekî din jî fuzayan
diceribine.

Îranê roketek nû ya bi navê 'kevgoşer' ceriband. Li gora agahiyên wezirê paraztinê Ahmed Wahidi di vê roketê de misk, kûsi û kurm jî hebû ne.

Serokê İranê Ehmedinejad jî bi minasebeta ceribandina roketa nû axifi. Ahmedinejad di axavtina xwe de disa devdirêjî kir û got; herçî çaraliyê İranê bi dujmin û seqelan ve dorpeçayı ye jî tu hêz nikare berê xwe bide

şəqəlin və dövri peşəyə rəsədxanəsi həzirliklər üçün tətbiq olunur.

Berdevke Qesra Spi ji idamen dawin en li Irane bi
tundi şermezar kir. HAWAR NET.com

KURTE NÜGEVĒN NAV NETE



KURTE NÜÇEYÊN NAVNETEWEYÎ

Stratejiya Emerîkî diguhere

Ayedarêñ parastina Emerîkî dibêjin stratîjiya nexşekêşana
şerî ji layê leşkerê Amerîkî ve
tê guhertin. Li çarçova straticiya nû, leşkerê Amerîkî ku
nuha du şerên mezin dike li Îraq û Afganistanê, xwe bo şerên
bicûktir amade dike.

Elmenya CD'ya ji 'hacker'ekî dikire

Hackerekî hamû agahiyêن li ser 1500 almanêن hesabêن wan yêن dizi li Swisreyê hene, dizi û xiste mazatê. Hackerek navê wî nedîyar agahiyêن derbarê 1500 almanêن hesabêن wan yêن dizi li bankêن Swisreyê hene dizi. Hacker diyar kir ku ew bo van agahiyân 2,5 milyon Euro dixwaze û muşteriyê wî yê péşin ji hukumeta alman e.

Ferensa forûma navnetewî ya
derbarê qedexekirina çekên
atomî saz dike

Li Ferensa forûma navnetewî ya derbarê qedexekirina çekên atomî lidar dikeve . Di forûmê de nêzê 200 diplomat, cangawar , ú rewşenbir besdariyê dikan . Amadakar dibêjin wata forûm mezine bi taybeti jî berî sameta girêdayî bi çekên atomî ú asayışê ve ,ku di meha nisanê de tê lidar xistin ú hreweha konferasa meha gulanê ya derbarê lêvenêrîna peymana ne belavkirina çekên atomî .Forûma Parîzê 4 sibatê dest pê dike


Berfê jiyana li Ewrûpayê xetimand

Berf û bahoze kar û xebat li hin deverêن
Almanya û İtalya dan rawestandinê..
Euronewsê ragihand ku sirr û seqema girane
zivistanê ser Ewropayê girtiye û bakura vê
parezeminê cemidandiye û berf û borana giran
karûbarên tranzit û transportê li vê navçê de
dane rawestandinê û qismeke firin geha
Hamburgê hatiye girtinê.
Herwiha vê televizyonê ragihand ku 5 kes ji
ber qezaya terafike ku berf û boran bûye sebebê
wê li vê devera Almanyayê jiyana xwe ji dest
dane. HAWAR NET.com

Rûsyâ petrola Iraqê hildibêre

Hate diyarkirin ku şirketa petrolê ya Rûsyayê LUKoil û ya Norwêcê Statolinê bi hev re dê li Iraqê 30 milyar dolar razemeniya petrolê bikin. Li gorî nûçeya CHA'yê, piştî ku roja berê li Iraqê imze avêtin, Serokwezirê Rûsyayê Vladimir Putin û LUKoil CEO'su Vagit Alekperov hatin cem hev hate eşkerekirin dê Kurna-2 a rojava 4,5 milyar dolar Beşir Atalay giştî dê 30 milyar dolar razemenî bê kirin.

Ji El-Qeîdeyê rîbazeke ecêb...



MI5 hemû cîhanê hisvar kir

Rexistina istixbaratê ya Îngilîstanê hemû cihanê hişyar kir; Militanê El Qaideyê dikarin bombeyan bi emeliyatê di nav laşen xwe de veşerin.

Servîsa itixbaratê MI5 diyar kir ku li hemberî pêşketina teknolojik adi balafirxaneyan de militanên El-Qeideyê jî rébazên xwe diguherinin. Ëdi militanên El-Qedideyê dikarin bombeyan bi emeliyatê di nav laşen xwe bi cih bikin. Jin jî dikarin weke slikonê di nav pêşîren xwe bi cih bikin. HAWAR.NET.com

Şensa Sarkozy a ji nû ve hilbijartinê kêm dibe

Texte Sarkozz dihêje



PARIS: Nicolas Sarkozy ku bi piştgiriyeke mezin a gelê Frensayê bû serokkomar li gor anketên dawîn rewşa wî di xeterê de ye. Li gor lêkolineke şirketekê anketan şensa Nicolas Sarkozy ji bo ji nû ve hilbijartînê her diçe kêmîtir dibe. Li gor anketa han piştgiriya bo Sarkozy daketiya dora ji % 31'an. Li gor şiroveyan di daketina piştgiriya bo Sarkozy de bandora aboriyê û kêm kirina mafan hene. HAWAR NET.com

HAWAR

kurdistan amed duhok
zanyarî zaxo batman sine agîrî xaneqîn
mêrdin hewlîr erdiç bedlîs
cizîr erxenî erîn wan colêmerg riha
sîrt sîrnex mehebad qamîşlo
sîlêmani nûce idir
kerkük
washington cihan
paris yam tokyo tel aviv
mexico tehran bûyer teknoloji
brusel zanist ziman huner
aktuel rojev medya sîrove
çand

zanîn xwe nasîn e...

HAWAR NET

hawarnet.com

"Şewba Berazan lawaz bû lê rîsk dewam dike"

Şewba Berazan li cîhanê bû sedema mirina bi hezaran kesî....

LONDON (Pêşketin) : Rêxistina Tenduristi a Dinyayê (WHO), di malpera xwe a internetê de agahdariyek weşand. Di raporê de tê diyar kirin ku belav bûna şewba berazan sekiniye lê xeter dewam dike. Agahdariyê de hate derbdan ku nexweşî dawiya adarê de derket û en gelek bedêl parzemîn a Emerika da. Di heremê de ji 190 hezar û 113 qewaman da 1876 mirin çêbuye. Di dûv parzemîna Emerîqa'yêre başrûr ê roşhilat a Asya-Pasifik bi 49 hezar û 797 qewaman de 203 miri tê. hate diyarkirin Ewrûpa ji 42 hezar û 557 qewamande 85 kes jiyana xwe dest dane.

Di Efrika'yê de ji 3 hezar û 843 qewam hatiye çêbûn û 11 kes ji jiyana xwe dest daye. RTD balkışand ku şewba beraza 117 dewletan zêde 209 hezar kes nexweş existiye. Li Ewrûpa ú gelek welatên din, hejmara kesen ji ber şewba barazê dimirin, kêm dibe. Lé belê li Tirkîyê ji, hejmara miriyan zêde dibe. Wezereta Tenduristiya Tirk der barê nexweşîya şewba berazan de daxuyaniyek weşand. Wezeretê idia kiriye ku hejmara kesen ji ber vê nexweşiyê dimirin kêm dibe. Li gorî wezeretê, hejmara kesen heta niha ji ber şewba barazê mirine, HAWAR NET.com



Li Ewrûpa ú gelek welatên din, hejmara kesen ji ber şewba barazê dimirin, kêm dibe. Lé belê li Tirkîyê ji, hejmara miriyan zêde dibe.

Îran him dibêje "li hevhatin" him jî fuzeyan dişîne

Îran dev ji gavêx xwe yên xeter benade..

TEHRAN: Îran li aliye ki dibêje dewlemend kirina uranyûmê dikare li dervey iranê pêk bine li aliye ki jî fuzayan diceribine. Îranê roketek nû ya bi navê 'kevgoşer' ceriband. Li gora agahiyêne wezirê paraztinê Ahmed Wahidi di vê roketê de mişk, kûsi û kurm ji hebû ne.

Serokê Îranê Ehmedinejad ji bi minasebeta ceribandina roketa nû axifi. Ahmedinejad di axavtina xwe de disa devdirêji kir û got; herçî çaraliyê Îranê bi dujmin û şeqelan ve dorpeçayı ye ji tu hêz nikare berê xwe bide Îranê û ew ê programa xwe ya atomî berdewam bikin... . HAWAR NET.com

Gelo 2011'an dê Felestîn karibe serxwebûnê ûlan bike?

Serokwezîrê otonomya Felestînî Selam Feyad li konferansê salane yê derbarê aramîyê li bajarê îsraîlî Gêrsîlî ragihand , ku felestînî amadene di sala 2011 a dewleta xwe ya netewî avabikin

QUDUS (Pêşketin): Bi gotinê wi divî warî de bi taybeti aboriya felestîni tê vejandin , institütên desthilatê têne avakirin û efekta hêzén ewlekariyê bilind dibe. Di nerîna wi de di sala 2011 a de gerek gelek tiştîn erêni diyar bibin , ku bandoriyê liser biryara siyasi bikin .

Lê Rojhilatnas Vladimir Ahmetov bi guman e ku Felestîni bitena xwe karibin dewleta serixwe ûlan bikin:

Ahmetov dibêje; Mercen girêdayî bi jiyana dewleta Felestîni ya serwer ne cigirtine , bi taybeti ji di pirsên girêdayî bi vegera baneberan û Qudsâ rojhilat ve . Bi gotinê din ew pirsên liser dirêjaya salen bûhuri astengî li pêşîya diyaloga aştiyê sazdikin, hin ji bê çareserkirin mane

JI BO ZEDETIR NÜÇEYEN NAVNETWEYI hawarnet.com

DÊ DYE BI AVAYEKÎ ZANISTÎ ÈŞKENCEYÊ BIKE

Ji bo rîbazên nû yên teknikên lêpirsîna bersûcûn terorê dê lêkolinê zanisti bê pêkanîn...

Di dema Bush de ji, ber rîbazên xirab ên lêpirsinê a di "şerî diji terorê de" dîbû sedema nerazibûnan.

Diroktora İstixbaratê ya Amerikayê Dennis Blair diyar kir ku ji bo peyda kirina rîbazên nû yên teknikên lêpirsîna bersûcûn terorê dê lêkolinê zanisti bê pêkanîn.

Di daxûyaniya xwe de Balir zêdetir agahi nedâ... HAWAR NET.com

Li DYE'yê rekora mezin bûna ya 6 salêن dawîn

Mezin bûna aboriya DYE didome.

Ekonomiya DYE di cirkeya dawin a 200'an de bi %5,8 mezin bûna heri zêde ya 6 salêن dawîn

pêk anîn. Ev pêşketin di borseyan de rewşa DYE hînek din ber bi pozitif ve bir..

Li Qirxizistanê li dijî kurdan dek û dolab

Li bajarê Calal-Abada başûrê Qirxizistanê bi angaşta ku ciwanekî kurd keçke qirxiz taciz kiriye dijberiya neyartiya kurdan hat zêrandin û qirxiz dixwazin bi zextan kurdan ji herêma navbori derxin.

Qirxizên herêma navçeya Kok-Yangak a bajarê Calal-Abad a li başûrê Qirxizistanê li ser angaşta ciwanekî kurd û bi navê Hamza roja 20'ê çileyê keçke qirxiz taciz kiriye, dijberiya li hemberî kurdan her diçe zêde dibe. Pêr di li herêmê bi pêşengiyâ hin provokatoran girseya qirxiz hat zêrandin. Bi vê provakasyonê qirxizan dest bi kampanyeyê kir da ku 90 malbatên kurd ji cih û warêwan bidin rakirin û bixin ser riyên koçberiyê.

Der barê mijarê de lêpirsin didome. Lê girseya ku hat zêrandin ji pêr ve li navçeya Kok-Yangakê civiyaye bi dirûşmîn nijadperest berz dikin. Hêzén herêmi û çapemeniya herêmê ragihand ku kurdê 19 sali pişti bûyerê girtine binçavan û der barê mijarê de lêpirsin didome. Nûnerên kurd diyar dikin ku kesen navbori hisû aqilê wan ne di cih de ye. Lê ne rast e ku hêzén ewlehiyê de lêpirsinê de hemû kurdan berpîrs bigirin. Nûnerê Organizasyona Kurd a navçeya Kok-Yangak a Celal-Abatê Asin

Di KURDO de
her tişt li ber
destê te ye...

Ename, sohbet, listik
nûçe, video, kîf, agahî
û zêdetir...



Zanist û Teknolojî

Ger tedbîr neyê girtin dê di nava 5 salan de 85 mîlyon kes bimirin

AMED (Pêşketin)

Li cihanê her sal 7,6 mîlyon kes ji ber pêncêrê jiyana xwe ji dest didin. Rexistina Tenduristiyyê ya Cihanê bi minasebta roja kanserê ya cihanê daxûyaniyeke belav kir. Di daxûyaniye de rexistin derbarê belav bûna kanserê de hişyariyên giring da. Di daxûyaniye de tê diyar

kirin ku ger tedbirên pêwist neyêne vergirtin wê heta 2015'ye dibe ku 85 mîlyon kes ji ber pêncêrê jiyana xwe ji dest bidin. Di daxuyaniye de tê diyar kirin ku kêm kirina alkol û cixareyê, xwarina baş, spor kirin û teşxisa zû dikare hejmara nexweşan ji %40 kêm bike.



Pêşî li kanser ji dikare bê girtin" Yekitiya Tenduristiyyê ya Cihanê bi Yekitiya Diji Kanserê a Navnetweyi bi slogan "Pêşî kanser ji dikare bê girtin" réza çalakiyan dardixin. Yekitiya Tenduristiyyê ya Cihanê bi Yekitiya Diji Kanserê a Navnetweyi di réza çalakiyan xwe yên isal de fikra "Pêşî kanser ji dikare bê girtin" derdixin pê. Di kampayâyê wan rexisitan de tê diyar kirin ku mirov hin tedbiran dikare pêşî li pêncêre bigre. HAWAR NET.com

Netbook sektora kompîterê rizgar kir



AMED (Pêşketin): Bandora kriza aboriyê a ser sektora kompîterê kêm dibe... Sektora teknolojiyê bi taybeti ji kompîterê hêdi hêdi ji bandora kriza aboriyê derdikeve.

Li gor agahiyan sektora kompîterê bi saya netbookan ji badnora kriza aboriyê zêde çênebû. Hate zanin ku di nava sala 2009'an de 90 mîlyon heb kompîter hatine firtin û piraya wan netbook'un. Netbook ji notebookan biçûktur e û ji bo têketina internetê û karên rojane zêdetir tê bi kar anîn. Li gor agahiyan di nav şirketan de heri zêde HP û piştre ji ACER kompîter firotiye.

Bi Ipadê dema tablet pc'yan destpêkir

Kompîterên ser mase, notebook, netbook û niha ji tablet pc...



AMED (Pêşketin): Apple Ipad'a xwe nişanî medyayê da. Ipad xwedî giraniya 0.75 kg e û qelindiya wê ji 1.30 cm ye.

Hate diyar kirin ku di nava Ipad'ê de nézi 200 hezar sepan (uygulama) hene.

Di heman demê de Ipad weki e-pirtük, e-rojname ji dikare were bikaranîn. Tê texmin kirin Ipad bi 500 dollarî were firotin.

Dema tablet pc'yan tê

Kompîterên ser mase, notebook, netbook û niha ji tablet pc.. Di bazara kompîterên dé salên pêş me gellek rengintir be.

Şirketên kompîterê hêdi hêdi li gor ixtiyacên cûda bi şeweyen cûda kompîteran çedîkin. Kindle a ku wek e-pirtük té bikaranin minaka pêşin a vê yekê bû. Yek ji şeweyekê nû ya kompîteran kompîterên tayblet e. Demeke dirêj bû ku cihana teknolojiyê li benda Ipad'a Appelê bû.

Wek tê zanin şirketa Apple'ê bi Iphona xwe bazara telefonên mobil serûbin kiribû. Ji ber vê yekê ji bendewariya ji bo Ipad'ê ji hé zêdetir bû bû.

Minaka heri pêşin ya kompîterên tablet ji aliyê HP ve meha bihûri hatibû nasandin.

Reqîbên Ipadê zêde dibin; Gpad di rê de ye

Serê 'tablet pc' yan destpêkir.

Piştî ku Ipad ji aliyê Appelê ve hate derxistin û derket bazarê di cihana kompîtergeriyê de şereke nû destpêkir.

Bi Ipad'ê ku dema kompîterên tablet destpêkir şirketên nû ji di vi wari dest bi péngavan kirin.

Piştî Appelê û HP'ye niha ji Googlê dikeve bazara tablet pc'yan. Google ku bi Nexus One keti bû baraza telefonên mobil û sistema xebatinâ a ji bo kompîteran bi navê Google Chrome derxisti bû niha ji ser tablet pc'yeke dixebeite.

Hate zanin ku dibe ku navê tablet pc ya Google'lê bibe Gpad ú heta saleke derkeve bazarê. HAWAR NET.com

Spirit ser Mars'ê asê ma



NASA diyar kir ku ku ew ji Spirit'ê hêviyên xwe birine... Amûrê robot a bi navê Spirit ku li Marsé lêkolinan dikir û di 2004'an de ji aliyê NASAye ve hatibû şandin li Marsé ket nava heriyê û zanyar nekarin ji nav heriyê derxin. NASA diyar kir ku ku ew ji Spirit'ê hêviyên xwe birine û xebatêni ji bo rizgar kirina Spirit hatine rawestandin.

Lê NASA daxûya kir ku dê Spirit bi avayeki statik be ji dikare hin agahiyan bişine dînyayê. HAWAR NET.com

Heywax!; Ji %90'ê înternetê tije bû...

Li gel zêde bûna amûrên ku dikarin internetê bixebitinin hejmara malperan ji her roj zêdetir dibe. Zêde bûna hejmara malperan bû sedema kêmbûna navnişanên IP ku di internetê de tê bikarnin. Hate zanin ku navnişanên IP ber bi bi dawi bûnê de ye. Ji %10 hejmaran vala mane û ev ji bi avayeki pir zû diqedin. Saziya ku ji vê mijarê berpirsare Number Resource Organisation diyar kir ku ger derbasi IPv6 neye kirin dê hejmaren IPv4 di demeke nézik wê bi dawi bibin. HAWAR NET.com

Dermanê mucîze; Asprîn

Aspirin Li diji zêdetina laş, serêş û simptomên arsimê tê bikaranin. Herweki ji ber ku xwinê tenik dike, di NDD (nexweşiyên dil-demar), pêsigirtina mirina masûlkeyên dil de ji bikér e. Aspirin ji pel û qaşkîn dara bi (bidar) tê çekirin ku 3.500 sal in bandora pelên bidarê li ser laş tê zanin. Cureyên nûjen ên aspirinê ne sade ne. gelek elementên tekildar û vitaminan ji dihewin. Di roja me ji bo gellek eşan tê bikaranin. Di hin lêkolinan de tê idda kirin ku asprin rê li ber hinek kanseran ji digre..

Nexweşiya Parkînson nexweşîyeke çawa ye?

Nexweşîya Parkinson bi giştî bi mérén pir re cedibe lê bi jinan, cihêl û ciwanan re ji carna çedibe. Nexweşîya parkinsonê yek ji nexweşîyen neurologik e û mixabin sedi sed terapiya wê hêj nine. Bi xerabûna fonksiyonên meji xwe dide der. Pirrani li temendirêjan peyda dibe. Cureyekê felcê ye. Heger sedem bê zanin jê re "sendromên parkinsonien", heger neyê zanin "idyopatik parkinson" té gotin.

Nexweşîya Parkinson nexweşîyeke wisa ye ku her ku wext di ser de dibuhure girantir dibe ji ber wê ji Isaacs her ku çûye xirabtir bûye.

Her ku tesira dermanén wi kêm dibe an ji hêj bandor nedabeyê lerezek bi canê wi digre. Bi vê nexweşîyê canê meriv diricife û dilerze. Kesên ku nexweşîya kronik ango herdem ya Parkinson bi wan re hebin carna birêveçûna wan bi zehmet e, carna wek ku mat mayibin di ciyê xwe de diminin û nikarin bilebitin. Ev nexweşîya ku di sistema asabi de dertê bê çare ye û li ser cihanê şes milyon û sê hezar kes bi vê nexweşîn ketine.. Terapi di hin kesan de qe bersivê nade lê di gelekan da dide. Pirrani dermanén ku neuroyan ditetikinin tê bikaranin. Dîsa cihê ku problem heye tê tunekirin ku ev tenê eşâ nexweş kêm dike. Bi operasyonan nexweşî tê ceribandin. Alikariya sosyal pêwist e.

Kesên çavşîn, çavêن we ronî be; Hûn zîrektirin



Kesên çavên wan şinîn beramber kesên rengê çavên wan ne şin in zîrek tîrin. Li gor lêkolînekê da diyar kiriye ku xwedîyên çavên şin li gor pîvanekê zîrekî lê diyar dîbê beramber kesên din. Her wisa xûyakir li Emrika kesen çav şin gelek zîrekîn û di ceribandinê da serkefti ne û pêzânin di mejiyê wan da pirin...

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

**Hemû linkên ji medyaya
Kurdî.**

**Cihê we yê
destpêkê!**

Bixwinin - Zindî Temaşa û Gühdarı bikin
medyayakurdi.com



"Hişê wî di Hewa" de

AMED (Pêşketin)



Clooney di de "Up in the Air" jiyanê fam dike

Ryan xebatkareke şirketekîye ku hemû jiyanâ wî li bajaran di gerên karê de derbas dibe.

Ryan xwedî jiyanake azad e ku li balafir û erebeyan de derbas dibe.. Bi imkanen şirketa xwe diji û kîfa wi li cih e. Hemû tiştîn wi di baholekê de ye. Pişti ku şirketa Ryan budgeya gerên karê kîmtir dike Ryan dikeve na va têkoşineke nebawer.

Ü Ryan hê nû jina ku xewnêni wi dixemiland peyda kiribû. Pişti ku tiştîn té serê wi ev êdi difikire ku ka xwedî búna maleki tiştîki çawa ye? Film her çiqas wek çiroka Ryan'ê xûya dikibe ji di rasti de film bi çawaki rexneyî jiyanâ kari ya roja me dinêre. Ü bi şewyeke cûda bandorén kriza abori nişanî me dide. Karekterâ Ryan ji aliyê listikvanê navdar George Clooney ve té listin. SINEMAKURD



Listikvana xweşik Vera Farmiga jî li gel George Clooney listikavana sereke ye



Bazara muzîkê cihê xwe hişt muzîka dîjîtal

Li cihanê roj bi roj bazara firotina cd'yan biçûk dibe. Li beramberi vê yekê ji internet dibe çavkaniya yekane ya muzikê. Édi bi riya mp3'an herkes muzikê ji internetê peyda dike. Muzikçeker ji édi hêdi hêdi dest bi weşandina stranan tenê di internetê de dikan. Yanî édi li şûna ku CD were derxistin straneke hunermendê bi nirxeke erzan ser internetê té firotin. Rêjeya firotina muzikê a ser internetê li gel peyda kirina rébazên nû yên bazar kirinê her sal nezi %15 zêde dibe. Li gor texmina Federasyona Endustriya Fonogram ya Navneteweyi ku firotina cihani ya muzikê kontrol dike di sala 2010'an de ji % 35ê hemû firotinê muzikê firotina ji muzikê yê dîjîtal pêk bê. Beramberi vê yekê raporê ku her sal IFPI diweşîne wisa nişan dide ku muzikê dîjîtal wê formata CD ji holê raneye.

DYE bazara herî mezin e

Di layeke din de ji firotinê muzikê digital li gor 2008'an di 2009'an hinek zêde bûye. Bi giştî ji %80ê ev firotinê li DYE pêk tê. Bi giştî mezinya muzikê dîjîtal 4.6 milyar dolar e.

Li Amerikayê 2008'an de %20 muzikê ser internetê hatiye firotin. 2009'an de ji rîje bûye %29. Her wiha li gor raporê daxistina muzikê dîjîtal li Japonyayê heri zêde bo amûrên mobil pêk tê.

Di muzikê Kurdî bi mp3'en bêtelîf mafêñ hunermendan tê binpêkirin

Ji ber ku li Kurdistanê bi rexinistin bûyinak navendi nine û dezgehén kontrol kirinê nine muzikê dîjîtal bi riya mp3'en ne yasa yi keda hunermendêne Kurd té talan kirin û guhdarên Kurd ji di vî warî de zêde hestiyar ninin û CDyên orjinal yên muzikê Kurdi nakirin û derbeyek mezin li pêşketina muzikê Kurdi dixin. Her wiha ji ber nebiyana dewleteke serbixwe ya Kurdistanê istatistikên muzikê Kurdi di raporê navneteweyi de nayê daxil kirin..

Daxistina mp3'en qanûni rî li zîndî búna bazara muzikê vedike Li aliyeke din ji malperên parvekirina muzikê a qanûni rî dide ku herkes muzikê qanûni û bê pere daxine kompitera xwe û guhdari bike.

HAVVAR NET.com

Dormen provaya lîstika kurdî dike



Promiyera listika bi navê 'Çirokén Zivistanê' ku derhêneriy wê Dormen dike dest pê kir. Promiyera listikê dê 26'ê mehê li Amedê pêk bê û listik yekem car dê derkeve ser dikê. Şanogerê navdar Haldun Dormen, dest bi provayê listika xwe ya bi kurdi ya bi navê Çirokeke Zivistanê kir. Promiyera listikê dê di 26'ê mehê de li Salona Şanoyê ya Şaredariya Amedê bê listin.

Şanoger Haldun Dormen, dê di jiyanâ xwe ya şanogeriyê de cara yekemîn derhêneriya listikeke bi kurdi bike. Di 26'ê sibatê de ji dê promiyera listikê pêk bê. Dormen der barê xebatê xwe de hin agahi dan û diyar kir ku ew ji ber ku cara yekem e derhêneriya listikeke bi kurdi dike, heyecana wî gelek zêde ye.

Romenake nû; Otobês

AMED (Pêşketin): Romana Kurdî ya ku bi ceribandinê xwe yên zimanî yên nû di qonaxa guherin û veguherinê de ye sal bi sal berê xwe dide deverên rengintir û dewlemendtir. Hedi be ji, ev romana ku ji vê qonaxê de weki berhem derdikeve, bi xwe re xwendevanê xwe yên nû ji tine. Yunus Eroğlu romannîs û wergérê xort (romana wi ya pêşin, Nameyek Ji Xwedê Re, Lis, 2007) bi romana xwe ya duduyan, Otobês, romana me û zimanê me ber bi deveke bi şewq û şemal ve dajo, xwendevanê xwe yên jir vedixwine ceng û cidala dengêki ku bi ser gelek dengan dabeş dibe.

Otobês romanek e, ku albûmeke ji gelek kesan pêkhati ye. Her paldankek bi dengê xwe yên navxweyi qala xwe dike. Dengen ku di paldankên otobêsekê de rûniştine û heftokan ji dawa xwe de dirjinin.

Yunus Eroğlu bi vê romana xwe ya bi navê Otobês ji zoré dide tixûbên zimanê Kurdî, bi zimaneki wiha bi silsileta xwe berdewam dibe.

Otobês

Yunus Eroğlu
Wêjeya Kurdi / Roman: 82 / 17
Reşemi 2010, 196 rûpel
ISBN: 978-605-5683-13-9

Beyonce Grammyê hêjand...



AMED (Pêşketin): Yek ji xelatên girîng ên cihana muzikâ li DYE'yê Grammy hatin belav kirin. 52'emin xelatê Grammyê li Los Angeles'ê hate belav kirin.

Di merasimê de Beyonce bi 6 û Taylor Swift di 4 beşan de xelat bi dest xistin.

Listeya xelatên din wisa ye;

-Qeyda Salê: "Use Somebody", Kings of Leon

-Albûma Salê: "Fearless", Taylor Swift

-Strana salê: "Single Ladies (Put A Ring On It)", Beyoncé Knowles

Albûma heri baş pop ya salê : "The E.N.D.", The Black Eyed Peas

Stranbêja heri baş popê ya salê: "Halo", Beyoncé Knowles

Stranbêjê heri baş popê ya salê: "Make It Mine", Jason Mraz

Albûma heri baş a Rockê ya salê: "21st Century Breakdown", Green Day

Strana heri baş Rockê ya salê: "Use Somebody", Kings of Leon MUZIKKURD.com

Avatar, Titanîkê noq kir...

Cihana sinemayê bi serkeftina filmê avatarê diheje. Filmê nû ya James Cameron Avatar James Cameron filma Titanik ku disa ew kişandibû û serkeftineke pir mezin bidest xisti bû û rekora filmê ku heri zêde pere bidest xisti bû.

Filmê Avatar di warê xesilatê de Titanikê li dû xwe hişt. Avatar di 6 hefteyê 1 milyar 859 milyon dollar qezenc bi dest xist. Tê hêvî kirin ku Avatar di Oscarê de ji serkeftineke mezin bi dest bixe.. SINEMAKURD

Ev pisîk kêsên ber mirinê texmîn dike



Pisika bi navê Oscar a 5 sali xwedî qabileyetekê ecêb e. Oscar di nexweşxaneyeke a li Rhode Island'de de heta niha mirina 50 kesan texmin kir. Pisporê geriatriyê Dr David Rosa cawa ewil di sala 2007'an de di kovareke a zanisti de behsa qebiliyeta Oscarê kiri bû.

Oscar piştî 2007'ê ji mirina gellek kesan texmin kiriy. Oscar dema ku diçe cem nexweşke rûndine ev nexweş di demeke kin de jiyana xwe ji dest dide. Wisa tê texmin kirin ku Oscar dikare şaneyen ku dimire pêbidese. HAWAR NET.com

Ji Angelina û Brad mesaja "em bi hev re ne"

Demeke dirêj bû ku di çapamaniya magazinê de dihat idda kirin ku Brad Pitt û Angelina Jolie ji hev vediqetin. Lî ew bi hev re hatin merasima xelatê li Los Angeles. Bi hev re hatina Angelina û Brad çapamaniyê matmayî hişt. Dihate idda kirin ku ji bo hev berdanê hemû amadekarî hatine kirin.



Krîza "pedala xazê" mezin diber

Şirketa otomotivê a mezin ya Japonyayê Toyota çend roj berê 9 milyon wesayîten xwe yên ku hatine firotin ji xwediyê wan û ji bazarê vedikişine.

Hatibû diyar kirin ku sedema paşve kişandinê ji ber pirsgirêkeke di pedala xazê ye. Piştî Toyotayê doh ji Peugeot ji 100 hezar otobomilêne xwe yên Peugeot 107 ve Citroen ji Citroen c1 paş ve kişand. Paşve kişandina otomobilan cihana aboriyê serûbin kir û bû sedema aloziyan.

Serokê Totyotayê ji ber paşvekişandina erebeyan lêborin xwest

Masigiran 'masiyek zérin' girt
Li eyaleta Guangdong a Çinê masiyek zérin kete tora masigiran. Evê masiya 24 eyar zér, her kes matmayî hişt.

Li gori nûçeya medyaya Çinê, li navenda eyaletê li bajarê Guangzhou ev masi li ser okyanûse tête nişandayîn, ji malbata masizérän a nadide ye. Li gori lêkolînén zanyaran ev masiya ku weki zêri dibiriqe, bi rastî ji li gelek derên laşê wê zêre 24 eyar heye.

Nasname:
Rojnameya Pêşketin – Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.com'ê
Çapa Dijital
Xwedî û berpirsyarê giştî: Serhad B.RENAS
Gêrinendeyê Gîştî-Editori: Mihemed ZERAX
Navnişana webê: www.hawarnet.com / Têkîlî : agahi@hawarnet.com
Pêşketin wegeke Hawar Kurdistan Media Group e. Dezenget: www.hk-mg.net
Nôzeyän ku al dewîye nûçeyê de bi dest nisan Pêşketin û HAWAR NET.com katîye dayîn alîf
HAWAR NET.com enzax bi caukenî nisan oşan dikare bê bikarîn

Melhemâ parastina destan

Kevçiyek rûnê behivan, zerdikênu hêkan, kevçiyeki şeranî kil. Malzemeyan heta ku bibin mina melhemê tev bidin. Di sarkerê de bîhelin. Her ku lazim bû, di desten xwe bidin. Melhem, wê cildê destê we piparêze.



Bi avayekî tazî serxwebûna xwe pîroz kirin

Welatê Emerikaya Başûr Şili 200'emîn slavgera serxwebûna xwe pîroz kir

Welatê Emerikaya Başûr Şili 200'emîn slavgera serxwebûna xwe pîroz kir. Bi vê minasebbetê kesen ku di Plaja Heyv (Playa Lunas) de hatin cem hev, serxwebûna Şiliyê bi avayekî tazî û bi bazdana li beravê pîroz kirin.

Her wiha li gelempériya Şiliyê gellek çalakiyên çand û hunerê tê li dar xisitin.

Santiago mezintirin bajêr û paytextê Sileye ye..

Tîmêñ Hewlêr û Pêşmergeyê Silêmanî serketin

Di çarçoveya listikên heftiya 4'ê ya dewra duym ya liga nayab ya futbola Kurdistanê, tîmêñ Hewlêr û Pêşmerge ya Silamê biser ketin. Tima Hewlêre di yarîgeha Ala de mîvandariya tîma Xak kir û di encamê de tîma Hewlêre bi goleke yarizan Sermend Eziz di deqeyâ 47'an de bi ser ket. Rahênerê tîma Hewlêre Semir Babo, ji Aknewsê re diyar kir, "Dibû yarizanen me golên zêdetir bavétana lê ji ber lez kîrinê tenê karin golekê bavéjin". Di listineke din ya liga nayab ya Kurdistanê de, tima Hindirin li yarîgeha xwe li


hemberî tîma Pêşmerge ya Silêmanî bi 2 golên bê hember binket. Golên tîma Pêşmerge ya Silêmanî yarizan Hawkar Hisen di deqeyâ 45'an de û Cotyar Ceza di deqeyâ 75'an de avêtin.

Lîga futbola Kurdistanê bi berpirsyariya Yekitiya Navendi ya Futbola Kurdistanê birêve diçe û di werza isal de 14 tîm beşdarin. i 1.maça Kûpaya Afrikayê de Angola û Mali weka hev man: 4-4 Kûpa Afrikayê bêyi Togoyê dest pî kir. Pisti ku otobusa Togoyê bû armansa êriskekû û sê leyistikvan hatin kustin, Togo ji Kûpa Afrikayê

Sedema maqyaj kirina jinan heye

Pisporê mîjîyê Dr Ken Mogi di encama xebatêne xwe de gîhêst vê encamê ku dema jin xwe di neynik (awêne) de dibinin beşa "xelat kîrin" a mîjîyê wan dikeve hereketê. Zanyarén sedema xwe xemilandina jinan lêkolîn dikin diyar kîrin ku jina ku makyajê dike bi xwe baweriya

ecibandina mirovîn din xwebini di rihe wan de derdikeve holê. Zanyaran diyar dikin ku dibe ku heman hissa bextewariyê ku zilamê ku rûyên xwe jê dikin û kolonyayê ser rûyê xwe dide de jî derkeve holê.



Klipên nû, filmên karton bo zarokan, dokumanter, filmên ji sinemaya kurdi û cihanê, awazên dengbêjan, dimen, pêkenin, konseren hunermendêñ hezkiri

Nîha Zindî binêre

HAWARTV

JI BO REKLAM Û ÎLANÊN WE

Hûn dikarin di Pêşketin, HAWAR NET.com an ji weşanên din ên koma HAWAR de reklam û îlanên xwe bi nirxa herî gûncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com